



PIRS Û BERSIV

Çap: Cotmeh 2016

Ev belgeya bersivên pirsên rojane dide û her car tê nuh kirin.

Tomarkirina pêşîn, bi temamî tomarkirin, transfer-cûyinhatin, mijarên pêvajoyî, û agahiyên giştî

Ji bo îlticayê kesên ku xwe tomarkirine randevû tê dayîn. Ev kesên ku hatine tomarkirin, wê xizmetên îlticayê li gorî ciyê ku rûniştîye û hatiye tomarkirin û li gorî pêvajoya ku têda derbas bûye (li jêr tê diyarkirin) wê ji bo randevûyê bang wan bike. Randevûya ji bo îlticayê Yûnan ji bo hevgîhandina malbatê, ji bo vecihîkirinê ji bo welatîkî Ewropayê gava dudiya ye.

Randevû li ser malpera www.asylo.gov.gr a Xizmetên Îlticayê a Yûnan tî amadekirin. Çap'a li ser pel jî li hemî navendên fermî tî dayîn. Ji bo şewirmendiyê ji kerema xwe re herin li gel Qomîseriya bilind a Netewên Yekgirtî ji bo Penaberan (UNHCR). Peyama niviskî bi rêya telefonê (SMS) tenê ji bo meha îlonê hatine şandin. Peyamên niviskî bi rêya telefonê ji bo mehên din ji bo bibîrxistina randevûyên du heftên din wê werin şandin.

Randevû li gorî hêjmara tomarkirinê tî dayîn ne li gorî hêjmara qertê an jî dosya yê Girînge hun hêjmara tomarkirina xwe bibînin (di peyama niviskî de) ne hêjmara qerta xwe! Herdû hêjmar jî di qerta daxwaznameya îlticaya we da nivisandî ne (Ji kerema xwe re li pirs û bersiva 17'an mêzêkin).

Bi hêjmara tomarkirinê hun kanin, dem, saet û ciyê randevûya xwe hîn bibin. Di roja randevûya we de hewceye hun zarok û pitikên xwe, belgeyên xwe û dîsa qerta îlticayê bi xwera bînin û saet di 07:30 'da li ber rêveberiya ofîsa îlticayê amade bin.

Eger hun randevûya xwe wenda bikin, hewceye ji nuh ve pêvajoya randevûyê bi rêya Skype'ê dest pê bike.

Eger piştî tomarkirina pêşîn we ji ciyê xwe barkiriye hun kanin hemî hêjmarên tomarkirinê di înternetê da li ser malpera Xizmetên îlticayê randevûya xwe bibînin <http://asylo.gov.gr/en/?pageid=1499>.

TOMARKIRIN , LÊKOLÎN, AGAHDARÎ BI PEYAMÊN NIVISKÎ (SMS) BELGE

P1. Pêvajoya bi temamî tomarkirin li ku çê dibe?

B1. Ofîsên Îlticayê ku li seranserê welat ji bo ku daxwazên îlticayê ku hatine pêşî tomarkirin û ji bo bi temamî wan tomar bikin ew in:

- Yekîneya Îlticaya Alîmno ji 26/9/2016'an û pê da bi temamî tomarkirina dosyayên vecihîkirinê an jî hevgîhandina malbatê ji bo neteweyên ku mafê wan ê vecihîkirinê ji herema Attîkî hene.
- Ofîsa Îlticayê a heremî a Thessalonîkî bi temamî tomarkirina meseleyên vecihîkirinê an jî hevgîhandina malbatê ji bo neteweyên mafê wan ê vecihîkitinê hene, ji hindik navendên penaberan ji herema Thessalonîkî, Larîsa û Ioanîna pêk tîne.
- Ofîsa Îlticayê a Aleksandrûpolî bi temamî tomarkirina dosyayên vecihîkirinê an jî hevgîhandina malbatê ji bo neteweyên ku mafê wan ê vecihîkirinê hene ji hindik navendên ji herema Thessalonîkê pêk tîne.



- Yekîneya Îlticaya a Pîrea bi temamî tomarkirina dosyayên ji hemî Yûnan ên ku mafê wan ê vecihîkirinê û hevgihandina malbatê tune ne pêk tîne.
- Ofîsa Îlticayê a Attîkî bi temamî tomarkirina hevvelatîyên Sûriyê ku daxwaznameya wan li Yûnan wê were lêkolînkirin pêk tîne.

Ji bo agahiyên zêdetir ofîsan, navnîşan û bernameyên randevûya da û ji bo ofîsên Îlticayê ê din, ji kerema xwe re bikevin malpera Xizmetên Îlticayê a Yûnan (www.aaylo.gov.gr).

Ne li gorî navnîşana we a vê gavê lê li gorî navnîşana ku dema we xwe tomarkiriyêwê randevû bêm dayîn.

P2. Kî gerek pêvajoya bi temamî tomarkirinê bike ?

B2. Bi temamî xwe tomarkirin, pêvajoya gava a duyemîn a bernameya xwe tomarkirina ji bo daxwaznameya Îlticayê li Yûnan ,a ji bo hevgihandina malbatê a ji bo vecihîkirina li welatên Yekitiya Awrûpa yê (YA) ye .Hemî kesên ku ji 8'ê Hezîranê heta 31'ê Tîrmehê li xizmetên Îlticayê hatibûn tomarkirin ,hewceye xwe bi temamî tomarbikin.

Eger we xwe pêşiyê tomar nekiriye, dîsa jî hun kanin bi rêya Skype'ê daxwaza statûya parastina navnetewî bikin.

P3. Fast track (pêvajoya zû naskirina penabertiyê) ji bo Sûroyê çiyê?

B3. Fast track tenê ji bo kesên ku ji Sûriyê ne û ji bo Filistinîyê ku ji Sûriyê ne û li Yûnan Îlticayê dixwazin e. Eger we heta niha xwe tomar nekiriye û hun li Yûnan Îlticayê bixwazin, hewceye ji bo fast track'ê bi rêya Skype'ê randevûyê bigrin. Ji bo ku hun kanibin bi rêya Skype'ê randevûyê bigrin hewceye pasaporta we a Sûriyê hebe. (ji bo Filistinîyên li Sûriyê hewceye belgeya wan a seyhatê a ji bo penaberan ku dewleta Sûriyê daye wan hebe). Hevvelatîyên Sûriyê ku di mehên Hezîran û Tîrmehên da xwe tomarkirin lê piştî 20'ê Adarê ketibûn Yûnan û mafê wan û vecihîkirinê tune, ew kes wê bi rêya pêvajoya fast track ji bo Sûriyê , wê zûtir li Yûnan statûya parastina navnetewî bigrin.

P4. Eger min xwe bi rêya Skype'ê xwe tomarkiriye, pêvajo ji bo min çiyê?

B4. Eger we bi rêya Skype'ê xwe tomarkiriye, hunê agahiyên bi temamî ji bi tomarkirina xwe bigrin û piştî rojekê li ofîsa Îlticayê ku bi temamî werin tomarkirin, hun kanin qerta daxwaznameya Îlticayê a tomarkirina pêşîn ku we bi rêya Skype'ê xwe tomarkiribû bigrin.

P5. Eger ez randevûya xwe wenda bikim çi diqewime?

B5. Eger hun randevûya xwe wenda bikin an jî neçin rabdevûya xwe, daxwaznameya we tê sekinandin û hewceye pêvajoyê ji nuh de dest pê bike. Gerek hun ji nuhda randevûyê li ofîsa Îlticayê bi rêya Skype'ê bigrin û werin tomarkirin, wê piştî Adara 2017'an randevûya we were tayînkirin.

P6. Piştî ku ez bi temamî hatim tomarkirinez kanim qerta daxwaznameya Îlticayê a ku pêşiyê min xwe tomarkiriye ez li ba xwe bigrim?

B6. Na. Qerta ku we pêşiyê xwe tomarkiriye wê ji aliyê xizmetên Îlticayê ve bi qerta ku we bi temamî xwe tomarkiriye, wê were guhertin. Ev qerta ji bo her kesî daxwaza parastina navnetewî ku bi temamî xwe tomarkiriye tê dayîn û li ser wê hêjmara tomarkirinê tune lê hêjmara dosya ya we heye. Dîsa li ser vê qertê roj û tarîxa randevûya we ji bo hevpeyvîna Îlticayê dinivîsîne.



P7. Cîranê min piştî min hat lê pêşiya min randevû girt. Çima? Taybetiya pêşaniyê çi nin?

B7. Randevû bi rêya kompyûterê otomatîk tên dayîn û ji bo randevûya çar qriteran digrin ber çavan: a) Ê ku ji daxwaza kom'ên mirovên bê parastin b) li gorî kaxiza polês gava ku hun nu hatin, li gorî wê tarîxa ku li ser nivisandiyê c) hebûna wergeran-tercumanan d) û hebûna personelên tomarkirinê.

P8. Gava hêjmara tomarkirinê a peyama bi telefonê (SMS) ku ji min re hatiye şandin û hêjmara tomarkirina min hevdû nagrin çi diqewme?

B8. Bi temamî tomarkirina a meh'a Îlonê a 2016'da hindik şaşî ji bela bernameya kompyûterê çê bibûn û hindik hêjmarên tomarkirî hevdû nedigirtin. Eger ku hun jî rastî vê şaşiyê hatin, ji kerema xwe re bikevin malpera Xizmetên Îlticayê a Yûnan (<http://asylo.gov.gr/wp-content/uploads/2016/08/completeSeptember2016FinalRefugeeSchedule.pdf>) û ev lîsteyên ku li navenda û li wargehên kamp'an hatine bidarda kirin da hun ji bo randevûya xwe kanin agahiyên rast bibînin.

P9. Min peyam negirt. Çi diqewime? Wê meha Cotmehê jî peyam were şandin?

B9. Hemî pevajo ya tomarkirinê wê ji 1'ê Îlonê heta Nîsana 2017'an li ber xwe bide. Koma peyamên ewil ji bo meha Îlonê bû. Di nava meha Îlonê da kataloga bi temamî ji bo randevûya di malpera Xizmetên Îlticayê da hate weşandin. Ji 1'ê Cotmehê û pêda ji bo randevûya di heftê da carikê bi rêya peyamên niviskî (SMS) wê werin şandin.

P10. Vê gavê min peyam girt, çi lazime ez bikim?

B10. Eger hun li herema Attîkî ne ji kerema xwe re bi navgîna veguhastinê (otobûs metro hwd) di saet û roja xwe da xwe bigihînin ofîsa îlticayê. E ku hatin ji bo we zahmet e, hun kanin ji bo hatina xwe alîkariyê ji Qomîseriya bilind a Netewên Yekgirtî ji bo Penaberan (UNHCR) bixwazin ji bo bilêtên otobûsê. E ku hun li navendên herema Thessalonîkî, Larîsa, Îoanîna ne ji bo hatina randevûya we a Ofîsa îlticayê Qomîseriya bilind a Netewên Yekgirtî ji bo Penaberan (UNHCR) wê alîkariya we bike. Ji kerema xwe re Qomîseriya bilind a Netewên Yekgirtî ji bo Penaberan (UNHCR) ji bo randevûya xwe, ciyê xwe û ofîsa têkildar agahdar bikin ji bo ku we bibin randevûya we.

P11. Ji bo tomarkirina bi temamî randevû dane me lê randevûya min û a malmata min her yek di rojê da dane. Ev tê çi maenê? Ez kanim randevûya xwe red bikim ji bo ku di eynî rojê da bi malbata xwe re herim ji bo tomarkirinê?

B11. Ji bo ku neferên malbatê giş di rojê da werin tomarkirin gelek li ser hatiye sekinandin. Lê mimkûne ji ber sedemên cûde ev her car bi cîh nayê, minake; wek tercuman-werger nayên dîtin. Ku di rojên cûde da hun werin tomarkirin jî, ew nayê wê maenê ku dosya ya we, daxwazên we wê cûda werin lêkolînkirin. Tenê gava ku di rojên cûde da neferên malbatikê randevûya wa hene, ev tê wê wateyê ku hunê di rojên cûde da herin xwe tomarbikin. Eger di rojên cûde da zarokên we ên biçûk ji malmata we hene, ji kerema xwe re wê rojê ji bo randevûya li xizmetên îlticayê lazime yekî mezin biwan re here. Neferên malbata we ê ku piştî diçin ji bo bi temamî tomarkirinê hewceye personelê tomarkirinê ji bo hêjmara dosyaya malbatê wî agahdar bikin.

Eger ku we rabdevûya xwe wenda kir, hewceye bi rêya Skype'ê ji nu da hun xwe tomarbikin. Ji ber ku rabdevûyên ji bo bi temamî xwe tomarkirin ji aliyê daxwazên îlticayê ji kesên din ve hatiye girtin.



P12. Ez kanim ne di roja ku hêjmara tomarkirina min da nivîsîye, lê di rojek din da biçim Xizmetên Îlticayê?

B12. Hewceye hun di roja ku di hêjmara tomarkirinê da hatiye nivîsandin herin Xizmetên Îlticayê. Tenê gava ku Xizmetên Îlticayê bixwe ji we re go di kîjan rojê da werin hun kanin herin.

P13. Çima pirsgirêkin min ên tenduristî hene û dîsa jî nêziktir rabdevûyê nadin min?

B13. Ji bo randevûyan ne tenê pirsgirêken tenduristî ne lê çar qrîter hene ji bo randevû dayînê. Li dijî ku mirov di nav koma bêparastin da ye, hindik qrîterên din hene. Wek kêmbûna werger-tercuman û kêmbûna personelên Xizmetên Îlticayê ku hatiye tayînkirin ji bo bi temamî we tomarbikin û dîsa pêşitîyê didin mirovên ku pirsgirêka wan a tenduristiyê heye.

P14. Mirovên ku pirsgirêka wan a tenduristiyê heye an jî piştî tomarkirinê tenduristiya wan xirab bû û ketin rewşa kom'ên ku parastin ji wan re hewceye, çawa kanin Xizmetên Îlticayê agahdar bikin ji bo zûtir randevûyê bidin wan?

B14. Gava randevû hatin belavkirin çar qeîter girtin ber çavan: a) daxwazrên îlticayê ku di nav komên parastin ji wan re hewce ye b) roja ketina Yûnan c) ziman /hebûna werger-tercuman d) hebûna personelên li ofîsa îlticayê. Her wiha ku hun di nav komên ku parastin ji wan re lazime da bin ev qrîter ji girtine ber çavan ji bo randevû dayîn ê.

Eger di dema mayîna we da (rewşa tenduristiya) we û statûya koma merivên parastin ji wan re lazime xirabtir bûye ji dema ku xwe tomarbikiye, hewceye hun ji rêxistinên ku alîkariya însanan dikin li navenda we an jî li herema we hun bi wan bişewirin. Di dema ku randevûya we heye ji bo bi temamî tomarbikina we, lazime hun xizmetên îlticayê agahdar bikin ji bo xirabtirbûna tenduristiya we. Di her halûkarî da ji bo şexsikî bixwe lê tê mêzêkirin û bi giştî randevû ji nuhve nayê dayîn.

P15. Eger xwediyê malê ez bim û peyama niviskî ji min bitenê re were, ev ji bo hemî malbata min e jî?

B15. Na ne ji bo hemî malbatê ye. Ji bo her neferikî malbatê randevûya wî bi serê xwe ye. Û dîsa her neferikî malbatê bi serê xwe bi alîkariya personelê îlticayê û werger, ji bo tomarbikirinê belgeyekê dinivîsîne. Peyama niviskî (SMS) wê li gorî hêjmara malbatê ewqas peyam wê werin telefona we, ji ber ku hemî malbatê ev hêjmara telefonê dane xizmetên îlticayê. Ev ji bo hemî neferên malbatê derbas dibe, him ji bo kal û pîran, him jî ji bo zarokên biçûk. Ji bo zarokên qesr-biçûk dayîk û bav berpîrsiyaren. Zarokên biçûk nabe bi serê xwe herin xwe tomarbikin, hewceye dê an jî bavê wî pê re be. Eger kesik ji malbata we peyam negirt, ji kerema xwe re li malpera Xizmetên Îlticayê binêrin, li vir hemî agahî di derbarê randevû, navnîşana ofîsa heremî a îlticayê û hunê çawa herin wir.


P16. Car caran daxwazên îlticayê ku xwe bi temamî tomarbikine, carek din ji wan re peyam (SMS) ji wan re tê û navê wan dîsa di kataloga randevûya da heye. Ev çawa dibe?

B16. Eger qerta we a daxwaznameya îlticayê ku dane we, tê da dinivîsîne hêjmara dosya yê, ew tê wê wateyê ku hun bi temamî hatine tomarbikin. Û ew tê wê wateyê ku hewce nake hun ji bo randevûyê dîsa herin Xizmetên Îlticayê. Lê hewceye hun di roj û tarîxa ku ji bo hevpeyvînê hatiye nivîsandin hun herin ofîsa îlticayê.



P17. Hêjmara tomarkiriê çiyê û hêjmara dosya yê çiyê?

B17. Hêjmara tomarkirinê, ev hêjmara ku li ser rûpela qerta we dinivisîne û dema ku we xwe pêştomarkiriye dane we, ew hêjmar e.



Όνομα πατέρα/ Father's name	Ημερομηνία Πλήρους Καταγραφής/ Date of Lodging
Όνομα μητέρας/ Mother's name	01/06/2016 - 07:00
Ημερομηνία γέννησης/Date of birth 07/12/1998	Ημερομηνία λήξης/Date of expiry 01/06/2016
Τόπος γέννησης/Place of birth	
Υπηκοότητα/Nationality	Αρμόδιο Γραφείο Ασύλου/Competent Asylum Office
Διεύθυνση διαμονής/Residence address	ΠΕΡΙΦΕΡΕΙΑΚΟ ΓΡΑΦΕΙΟ ΑΣΥΛΟΥ ΑΤΤΙΚΗΣ

Όνομα/ Name	Ημερομηνία έκδοσης/Date of issue 05/05/2016	Υπογραφή αυτούτος	Υπογραφή υπαλλήλου signatures
Επώνυμο/ Surname	Ημερομηνία Υποβολής αιτήματος/Date of Registration 13/04/2016		
	<u>Αριθ. Απλής Καταγραφής/Registration</u>		
	Αριθ. Δελτίου/Card No:		

Hêjmara dosya yê, ew hêjmara ku li ser rûpela qerta we dinivisîne û dema we xwe bi temamî xwe tomarkiriye dane we, ew hêjmar e.



Όνομα πατέρα/ Father's name	Ημερ. συνέντευξης ή εξέτασης προσφυγής/ Date of interview or examination of appeal
Όνομα μητέρας/ Mother's name	17/06/2013
Ημερομηνία γέννησης/Date of birth	Ημερομηνία λήξης/Date of expiry 10/09/2013
Τόπος γέννησης/Place of birth	
Υπηκοότητα/Nationality	Υπογραφή αυτούτος
Διεύθυνση διαμονής/Residence address ΑΘΗΝΑ, ΑΘΗΝΩΝ /	Υπογραφή υπαλλήλου signatures

Όνομα/ Name	Ημερομηνία έκδοσης/Date of issue 10/06/2013
Επώνυμο/ Surname	Ημερομηνία Υποβολής αιτήματος/Date of application 10/06/2013
	Αριθ. Υπ./Case No:
	Αριθ. Δελτίου/Card No:

P18. Piştî ku min li Yûnan xwe tomarkir, ez kanim herim welatîkî din? Û gava ku ew welatê ku ez çume ku min bi şûnda bişînin ez kanim li Yûnan bi temamî xwe tomarbikim?

B18. Piştî xwe tomarkirinê û heta ku ev pêvajoyê bi dawî dibe, gerek hun li Yûnanîstanê bin. Hun wek daxwazên îlticayê ne û bi vê statûyê ji bo seyhatê mafê we, wek we xwe bi temamî tomarkiriye yek in.

P19. Gava ku qerta min a pêşî tomarkirinê hatiye qetandin an jî hatiye çirandin çi diqewime?

B19. Hun bi qerta qetandî an jî çirandî jî kanin herin randevûya xwe ji bo bi temamî hun werin tomarkirin. Ewê bi qeyda we were çêkirin û qert ji bi parastina navnetewî bidine we. Ewên ku belge-qerta wan a daxwaza îlticayê hatiye qetandin an jî çirandin, kanin pêşiya randevûya xwe herin Xizmetên Îlticayê qerta xwe biguherînin.

Eger we randevûya xwe wenda kir an jî hun neçûn, hewceye hemî pêvajoyê ji nuhve dest pê bike. Hewceye hun dîsa bi rêya Skype'ê ji Xizmetên Îlticayê randevûke nuh bigrin. Ev randevû wê piştî Adara 2017'an wê were tayîn kirin.



P20. Ku qerta xwe a daxwaza parastina navnetewî (qerta daxwaza îlticayê) wenda bikim, ez çi kanim bikim?

B20. Eger hun qerta xwe wenda bikin, hewceye hun herin li ofîsa îlticayê ku ev qert dabûne we, hun wan agahdar bikin. Ev tenê ji bo hundirê welat derbas dibe. Ewê beyanamekê bidine we ji bo hun biçin li ba polês wendabûna qerta xwe beyan bikin. Polêsê kaxizeke xizmetê bide we, hun ê vê kaxiza xizmetê bigrin bînin bidin Xizmetên Îlticayê, ji bo ji were qertik nu derxînin. Ji bo ku qertek nu derînin herî kêr du meh lazimin. Di vê demê da hewceye gerek hun herdu belga jî li ser xwe bigerînin. Kaxiza xizmetên polês û beyanameya Xizmetên Îlticayê.

P21. Gava ku qerta tomarkirina pêşîn wenda bikim, çi diqewime?

B21. Eger qerta tomarkirina pêşîn wenda biba an jî were dizîn, Xizmetên Îlticayê qertek nu nade. Qerta we a tomarkirina pêşîn dema wê 12 meh in. Hewceye hun xwedî lê derkevin ji bo nê dizîn û nê wendakirin. Destûr tune ye ku hun vê qertê bidine yekî din an jî bifroşin. Eger hun qerta xwe wenda bikin, an jî hatibe dizîn, hewceye hun ji bo randevûyê herin rêveberiya ofîsa îlticayê ji bo tomarkirinê, wê dema randevûke nuh bidine we ji berku qerta we tune ye. Eger wêne-sûretê qerta we heye hewceye hun bidin Xizmetên Îlticayê.

P22. Ji roja ku me xwe tomakiriyê heta îro di malbata min de guhertin çêbûne (zarokî nu xwedê daye an jî yek ji nav malbatê çûye) ez çawa kanim Xizmetên Îlticayê agahdar bikim?

B22. Eger zaroka we piştî tomakirinê xwedê daye, hewceye hun zaroka xwe a nu xwedê daye bi tevî beyanameya nûfûsa wê hun bînin ji bo randevûya bi temamî tomakirinê. Bi vî avnayî zarok bi temamî wê were tomakirin û qerta parastina navnetewî (qerta daxwaza îlticayê) wê were dayîn.

P23. Di dema pêşi tomakirinê da ez wek zarokî di bin hijde salîda bûm, lê vê gavê ez bi ser hijde salî ketime, mafê min wek hevîn?

B23. Temenê emrê we ji bo maf û statûya îlticayê an jî ji bo mafê vecihîkirinê (eku ev mafê we heye) nayên guhertin. Tenê ji bo mafê hevîhandina malbatê di dema ku hun bi temamî xwe tomakirin eger temenê we bi ser hijde salî ketibe tê guhertin. Dîsa jî ev di destê welatê ku tu dixwazî biçî da ye an wê te qebûl bikin an na.

P24. Temenê min di bin hijde salîda ye, ji bo pêvajoya bi temamî, ji bo temenê min were xwîya kirin hewceye lêkolîn lê were kirin?

B24. Di pêvajoya bi temamî tomakirinê da wê ji we were xwastin ji bo tarîxa xwedêdana xwe beyan bikin. Eger hun temenê xwe şaş bêjin, ev wê bandoreke negatîf li daxwaznameya we bike. Hewceye ji bi temenê xwe geren hun herdem rastiyê bêjin.

P25. Eger yekî 65 salî ye an jî jê mezintire emrê wî, kane disya ya xwe bi zarokên xwe ên bi ser hijde salî re bike yek?

B25. Tenê endamên malbatê (bav, dayîk û zariokên di bin hijde salî re) kanin bikevin nav dasya ya îlticayê a malbatê. Mirovên ku temenê wan mezinin û zarokên ku emrê wan bi ser hijde salî re ne, dosya ya wan wê cûde cûde wê were lêkolînkirin, lê dosya ya wan wê dawiyê bihevê wê werin girêdan.



P26. Di dema pêvajoya bi temamî tomarkirinê da wê şopên tiliyê min bigrin? Gava ku bixwazim herim welatîkî din, çi diqewimin bi şopên tiliyên min?

B26. Eger dema hun ketin Yûnan şopên tiliyê we ji we hatin girtin, ev dikevin arşîva Eurodac, wê çaxê maneya wê tune ye ku di dema bi temamî tomarkirinê da carik din ji we şopên tiliyan bigrin an na.

Eger hun, wek ku mecbûrin, şopên tiliyên xwe nedin, wê daxwaza we a ji bo bi temamî tomarkirinê bi cî nê û wê daxwaza we di nivî da were qutkirin û mafê we û qerta daxwaza parastina navnetewî namîne. Û dîsa hun nikanin bibin xwedî yê mafên vecihîkirinê, hevghîndina malbatê û parastina navnetewî li Yûnan.

P27. Ji bo çi şopên tiliyên min dixwazin?

B27. Girtina şopên tiliyan ji bo pêvajoya îlticayê li hemî welatên Yekitiya Awrûpa yê mecbûriye. Bi vî rengî ev welatana zanin welatê ku ewil ketî Yekitita Awrûpa yê kîjan e.

TRANSPORT

P28. Di nav çend rojan da randevûya min heye. Ezê çawa rayedariya Ofîsa Îlticayê?

B28. Ciyê ku hun lê nin li wir bi Qomîseriya bilind a Netewên Yekgirtî ji bo Penaberan (UNHCR) bişewirin ewê ji bo çûyin û hatina randevûya we hal bikin. Ji bo navendên li herema Attîkî ji bo çûyin û hatina randevûyê ji bo hemî neferên malbatê bilêtên otobûsê tên dayîn (hindik caran ji bo çûyin û hatinê lazime hun otobûseke din an jî metro û trêne bigrin). Ji bo daxwazên îlticayê ku li herema Thessalonîkê, Larîssa û Îoanîna dimînin, Qomîseriya bilind a Netewên Yekgirtî ji bo Penaberan (UNHCR) wê çûyin û hatina we bi otobûsan hal bikin. Ji bo agahiyên çûyin û hatinê li navenda ku hun lê dimînin kanin wergirin.

Eger hun li Attîkî dimînin û randevûya we li Thessalonîkî, Aleksandrûpolî ye, wê demê Qomîseriya bilind a Netewên Yekgirtî ji bo Penaberan (UNHCR) wê ji were bilêtên otobûsên navbajaran bigre.

Eger rêwî zarokê biçûk be, yek bi zarokê biçûkê bêkes re (merivê wî an jî personelê rêxistineke dilxwaz) gerek bi wî re here, mesrefê wî yê ku pê re here jî wê Qomîseriya bilind a Netewên Yekgirtî ji bo Penaberan (UNHCR) bide.

Rehbera ji bo rayedara Ofîsa Îlticayê, rehbera ji bo çûyin û hatinê û xerîtên ofîsan di vê malperê da kanin bibînin.

<http://asylo.gov.gr/en/wp-content/uploads/2016/09/Offline-Appointments-at-the-Asylum-Servic-template-V2.pdf>

P29. Eger min bi rêya Skype'ê xwe tomarkiribe, dîsa wê mafê min ê çûyin û hatinê hebe?

B29. Erê, eger we bi rêya Skype'ê jî xwe tomarkiribe, ciyê ku hun lê nin heta rayedariya Ofîsa Îlticayê ji bo randevûya we, wê we bibin û bînin.

P30. Piştî randevûya min wê çi bibe? Wê min dîsa bi şûnda bînin ciyê min?

B30. Seyhata ku ji bo we û malbata we him çûyin him jî hatine. Qomîseriya bilind a Netewên Yekgirtî ji bo Penaberan (UNHCR) nikane ji were ciyekî peyda bike ji bo mayîna we, tenê heqê çûyin û hatina we dide. Hewceye hun vegezin navenda xwe, piştî bi temamî tomarkirina we Qomîseriya bilind a Netewên Yekgirtî ji bo Penaberan (UNHCR) an jî saziyên dilxwaz ji we re ciyekî peyda bikin.



P31. Eceba Qomîseriya bilind a Netewên Yekgirtî ji bo Penaberan (UNHCR) an jî saziyeke dilxwaz wê xwarinê bidine min û malbata min?

B31. Na. Eger hun an jî zarokên we hewcetiya we ji xwarinê heye, lazime hun xwarinê bi xwe re bibin.

CARESERYÊN BI KÊR TÊN: VECIHÎKIRIN, HEVGÎHANDINA MALBATÊ, PÊVAJOYA ÎLTICAYÊ LI YÛNAN

P32. Mafê kê ji bo vecihîkirinê heye?

B32. Mekanîzma ya vecihîkirinê li gorî netewên ku ji hevweletiyên welatîkî ku li Awrûpa yê li gorî statîstîka EUROSTAT ji % 75 an jî zêdetirên wan îltica girtine pêk tê. Li gorî rojevîkirina a dawî di 30'yê îlonê 2016'da hevweletiyên welatên ku ji % 75'ê wan îltica girtine: Erître, Qatar, Mozambîk, Baxreyn, Bûrûndî, Bhûtan, Sûriye û Yêmen e.

P33. Mafê kê heye ji bo hevghandina malbatê?

B33. Kesên mezin ku temenê wan (bi ser hijde salî ye) û ji malbata wan a dendik (malbata dendik, bav, dayîk û zarokên temenê wan di bin hijde salîda) li welatîkî Awrûpa yê bi qanûnî dimînin. Di vê rewşê da hun kanin daxwaz bikin û bixwazin ku bi mêr an jî bi jina xwe re ,an jî bi zarokê xwe ê temenê wan di bin hijde salî da ye û bi qanûnî li welatîkî Awrûpayê dimîne re bijîn. Eger hun zarokên bêkesinû bê wekilin li vir, hun kanin bixwazin herin ba, diya xwe bavê xwe, ba xwişk û birayê xwe, ba kal û pîra xwe, ba xal û mamê xwe bijîn.

P34. Piştî bi temamî tomarkirina ji bo vecihîkirinê çi gav hene?

B34. Xizmetên Îlticayê wê lêkolîna dosya we bike, eger hun şertên vecihîkirinê bi cî tînin, wê çaxê wê daxwaza we ji endamê dewletên Yekitiya Awrûpa ji bo lêkolînê wê were şandin. Eger daxwaza we were qebûlîkirin ji bo bernameya vecihîkirinê piştî bi temamî tomarkirina wan heta ku biçin, li Yûnan wê xanî ji wan re were temîn kirin.

P35. Cûdetiya di navbera hevghandina malbatê (qanûna Dûblîn ê) û hewelatiyên ku mafê wan ê vecihîkirinê hene çiyê?

B35. Hevghandina malbatê ji bo kesên ku endamên malbatek dendik (jin û mêr û zarokên temenê wan di bin hijde salî da) û daxwaznameya îltica wan ji aliyê welatîkî endamê Yekitiya Awrûpayê ve tê lêkolînkirin. Berendamên ji bo vecihîkirinê ewên ku daxwaz kirine herin welatîkî din û li wir daxwaza îlticaya wan were lêkolînkirin, lê mafê wan û hîlbijartina welatîkî tune ye ji bo vecihîkirinê.

P36. Ku min li Yûnan îltica girt, wê çi belgeyan bidine min?

B36. Gava ku li Yûnan parastina navnetewî hat dayîn ji bo we, wê destûra rûniştinê ji bo sê salan bidine we û ev hercar tê nuhkirin, dîsa mafê we heye ku hun daxwaza belgeyên seyhatê bikin. Hemî mafên ji bo parastina navnetewî ên ku mafê wan hene, kanin li vê malpera Xizmetên Îlticayê agahiyên bigrin. http://asylo.gov.gr/en/?page_id=471

P37. Çima meseleyên Dûblînê (hevghandina malbatê) û ên hevweletiyên ku mafê wan ê vecihîkirine hene , pêvajo ji bo wan cûde bi kar tê?

B37. Pêvajoya ji bo bi temamî tomarkirinê (ofîsên îlticayê, personelên ji bo tomarkirinê, wergêr û çuyin hatina wan ji bo tomarkirinê) him ji bo berendamên hevghandina malbatê tînin tomarkirin him jî ji bo berendamên vecihîkirinê tînin tomarkirin û hevweletiyên ku mafê û vecihîkirinê hene pêvajo ji bo hemî kesî eynî tê bi kar anîn. Tenê



cûdetî piştî tomarkirinê der tê holê (wek ji bo berendamên vecihîkirinê re xanî tê peyda kirin û biryara tomarkirinê ji bo wan zûtir derdikeve) . Hukumeta Yûnan, Qomîseriya bilind a Netewên Yekgirtî ji bo Penaberan (UNHCR) û saziyên hevkar ji bo kesên ku parastin ji wan re hewceye ên ji bo hevgîhandina malbatê re û kesên ku îltica li Yûnan xwastine re jî xanî peyda dikin.

P38. Gava ku daxwaza min ji bo hevgîhandina malbatê ji aliyê welatê ku ji malbata min kes li wirin were redkirin, çi diqewime?

B38. Gava dewleta ku te daxwaza hevgîhandina malbatê kiribû, daxwaza te red bikin, tu kanî li Yûnan daxwaza îlticayê bikî.

P39. Li Yûnan di navbera tomarkirinê û bi temamî tomarkirin ji bo hevgîhandina malbatê çiqase?

B39. Wext ji bo her daxwazikê cûde ye û dîsa li gorî rayedarên wî welatî ye. Teqez wê çend mehan li ber xwe bide.

P40. Li Yûnan di navbera tomarkirinê û bi temamî tomarkirin ji bo vecihîkirina li welatîkî Yekitiya Awrûpa yê çiqase?

B40. Wext ji bo her daxwazikê cûde ye û dîsa li gorî rayedarên wî welatî ye . Teqez wê çend mehan li ber xwe bide.

P41. Eger ez bixwazim herim hindik welatan, wek Almanya, Swêd, Fransa lê ji min re vecihîkirina welatîkî din derket, wê çi bibe?

B41. Tu nikanî vecihîkirina welatîkî hilbijêrî. Eger ku welatê ku ji te re derketiye te red kir, wê çaxê daxwaza te wê li Yûnan were lêkolînkirin.

P42. Gava ez vecihîkirina welatîkî red bikim an jî welatên ku ez dixwazim vecihîkirina min red bikin çi diqewimin?

B42. Eger tu vecihîkirina welatîkî red bikî an jî welatîkî te dixwast daxwaza vecihîkirina te red bike, tu kanî li Yûnan bimînî û daxwaza îlticaya te wê li Yûnan were lêkolînkirin. Eger ji bo vecihîkirinê Qomîseriya bilind a Netewên Yekgirtî ji bo Penaberan (UNHCR) xanî ke dabûn te, ji ber ku te welatê ku ji bo te hatibû vecihîkirin te red kiribû û ji ber ku mafê te û hilbijartina welatîkî din nemaye ,hewceye ew xanî yê ku dabûn te, tu wî vala bikî. Ji ber ku ev xanî ji bo vê armancê hatibû dayîn û êdî nema tu kanî tê da bimînî.

P43. Ez ji Iraq im, ez kanim vecihîkirinê bixwazim?

B43. Hewwelatiyên ji Iraqê ku heta 20'ê Adarê ketine Yûnan û heta 16'dê Hezîranê xwe tomarkirine,mafê wan û vecihîkirinê heye. Hewwelatiyên ji Iraq ên ku heta 20'ê Adarê ketine Yûnan û xwe piştî 16'ê Heziranê tomarkirine, mimkune ku li gorî tarîxa ku li ser kaxiza polês hatiye nivîsandin werin hesabkirin û mafê wan û vexihîkirinê hebe. Hewwelatiyên ji Iraq ku piştî 16'ê Heziranê ketine Yûnan mafê wan û vecihîkirinê tune. Di 16'ê Heziranê da hukumetên welatên Awrûpayê hatin agahdarkirin ku, ji kêmtirî % 75 Iraqî li Awrûpa yê parastina navnetwî girtine.

P44. Min bawer dikir ku piştî tomarkirinê an jî bi temamî tomarkirinê hukumetê wê xanî ke an jî odeyek li otêlê bidana min.

B44. Ev kesên ku tevî bernameya vecihîkirina Yekitiya Awrûpa yê bûne, piştî bi temamî tomarkirina wan pêşiya ku ji Yûnan biçin û eger berendamê vecihîkirinê ne ,xanî kî ji bo demî didin wan. Ew kesên din kanin yek ji navendên li nava welat bimînî û wê di bin îdareya



dewleta Yûnan da bin. Qomîseriya bilind a Netewên Yekgirtî ji bo Penaberan (UNHCR) carna ji bo demî, xanî ji bo daxwazên îlticayê ên komên parastin ji wan re lazime li gorî îmkanê ku di destda hene xanî ji wan re peyda dike.

P45. Ez kanim di dema bi temamî tomakirinê da li gorî rêke huqûqî û li gorî qanûna Dûblînê di şûna bernameya vecihîkirinê ez hevghandina malbatê hilbijêrim?

B45. Na, tu nikanî. Hilbijartina vecihîkirinê an jî hevghandina malbatê li gorî qarekterên meselê te hatine hilbijartin. Xizmetên Îlticayê wê biryara herî bîaqil bigre.

Agahiyên zêdetir :

Ji bo pêvajoya îlticayê a li Yûnanîstanê agahî li vir in:

http://asylo.gov.gr/en/?page_id=62

Agahiyên ji bo qanûna Dûblînê a 3'a a ji bo hevghandina malbatê li vir in:

http://asylo.gov.gr/en/?page_id=81

Agahiyên ji bo bernameya vecihîkirinê li vir in:

http://asylo.gov.gr/en/wp-content/uploads/2015/11/RELOCATION_EN.pdf

Agahiyên ji bo ên ku mafê wan ê îlticayê/parastina navnetewî li Yûnanîstanê li vir in:

http://asylo.gov.gr/en/?page_id=471